

Destlat û Çareserkirina Gendeleyê (Şorên pir bayê kur !?)

Rozad Elî

Dema ku tiştê kufkî dibe, digemire û bi kêrî daxwaz û pêdviyan netê, jê re dibêjin bûye gemiriye, yan gendele bûye.

Gendelebûn di gelek waran de peda dibe. Di xwarin û vexwarinê de û ra di gelek war û endamên sirûşt û jîngehê de jî çê dibe.

Gendele ne di tiştên şênber de tenê çê dibe, ew di warên razberî de jî peyda dibe, li wir jî giran dibe û kavliyê bi xwe re tine. Gendele di hiş û sinciyên mirov û kirinên wî û elek warên komelgê de jî peyda dibe.

Netenê wilo, gelek caran çembera gendele yê fereh dibe, û dikeve binyata dewletan jî, û hemî sazî damezraw û binyata wê digre, dide ber û kavil dike.

Pend Kurdî ya kevin dibêje «Av di golan de bimîne digemire», sedemeke gendele yê ye bîngehîn diyar û rave dike. Ew xuya dike û dibêje, ku eger tiştê, çi be, demeke dirêj di cihê xwe de, di rewşê bê nûbûn û paqijkirin de bimîne, ta ava zelal be jî, dîsa digemire, bê sûd dibe, na belê zîyanê û ra mirinê jî li hawîrdorê peyda dike.

Li Sûryayê, ji salên pir dirêj de, partî û rêxistinên siyasî yên li derveyî sazûmanê û hinek ji yên hundurê wê jî, çêre gendele yê pirowarî ku di nava sazûmanê de, û li ba pêşber û berpirsên destlatên (nimûne jî pir in), û di hemî movikên dewletê de hene, dibin. Lê destlata yekpartî û yek nêrîn, ew rastiyên beloq înkâr dikir û dikir ku nabîne û paşguh dikir. Sazûmanê rê li ber baweriyên gel û gotinên wan partiyên dibirî, devê wan bi hemî şêweyan digirt. Ji xwe wê hemî alavên ragihandinê jî xistine destê xwe, û pê ser rastiyan dipêçe, û ser gendelebûna sazûmanê û destlata xwe digire û rûyê dewletê û destlat xwe sipî dide xuyan û wê serkeftî divar kir

Lê belê, «Rum di tûran de netên veşartin», gendelebûn jî bi lêmikûrnehatin, çêrenebûn û sergirtinê netê veşartin û netê çareserkirin jî. Çinkî çiqas ser rûyê tişt yan warên ku gendelebûne were pêçan û fodilkirin, nemaze jî eger bi meziniyê gendele yê destlatê be, ew hîç nayê veşartin, ji ber ku bîna wê derketiye û li hemî hawîrdoran belav dibe.

Di van rewşan de, û piştî ku gendelebûnê di hemî warên dewlet û destlatê de konik girt û ew bêxêr kirin, komelgeha Sûrî jandar kir û hin bi hin ew jî têk diçe, hênû destlat pir bi fedî çêre gendele yê û çareserkirina wê dibe, wekî ku ew pirs hê nû peyda bûye, yan jî ji derveyî welêt ji me re hatiye, yan jî ji hêla xêrnexwazan de hatibe şandine!?

Lê tiştê herî mitêl ew e ku dewlet «kerê berdide dere kurtên», ango ew li sedem, jêder çavkaniyên gendele yê yên rastînkî û bîngehîn nagere, ew tenê li encaman miqate dibe û bi wan re dikeve keftleftê, wek girtina hin karmendên biçûk, yan destbirîna wan ji kar... û hwd.

Çareserkirina pirsê gendele yê û rûdawên wê ne tenê bi gotina ye, ew ji dîtina wê, tazîkirina wê, naskirina sedemên wê yên bîngehîn, sezakirina kesên wê û ji holê rakirina wan sedeman de dest pê dibe. Ji xwe, pêkanîna wan erkan re jî pêdviyên bîngehîn gerek in.

Li serê wan pêdviyan, zor pêwîst e, ku rojê berî hemî alavên ragihandinê serbest bibin û ji bin çengê destlatê û dewletê bi derkevin, ew bibin xudî maf, erk û ji hêla hemî saziyên destlatê de werin rêzdarkirin.

Em tev dizanin, belkî li hemî welatên ku sazûmanên xwe wek yê Sûryayê ne, dezgehên asayîşî ne tenê naskirin û çareserîya rûdawên gendele yê aloz dikin, li bervajî wê, ew rêkê ji bertîl û tiştên din re vekin, **D.R.(12)**